# Ronahî

şopdara rastiyê ye


www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 599 3-Gulan- 2019 Rojnameya Siyasî û Çandî


## Çeteyên Tirkiyê careke din bajarê Cebilê kirin hedef




Dezgehên çapemeniyê yên nêzî rejîma Sûriyê ragihandin ku komên çete yên girêdayî Tirkiyê ku li parêzgeha Idlibê û gundewarên bakurê Laziqiyê nêzî sînorê Tirkiyê bicih bûne, gundê Bexdirmo ê bejahiya bajarê Cebilê kirin hedefa êrîşên xwe. Di encamê de sivîlekî jiyana xwe ji dest da û 4 kesên din birîndar bûn û zirarên madî di malan de çêbûn.

## Leuenberger: Tecrîd bi tifaqa gelan dikare rabe



Hevserokê berê yê Partiya Keskan a Swîsreyê û Parêzvanê Mafên Mirovan Ueli Leuenberger tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û berxwedana grevên birçîbûnê ya li dijî tecrîdê ku di asteke metirsîdar de ye, nirxand. Leuenberger diyar kir ku tecrîdkirina Ocalan şêweyekî êşkenceyê ye û tecrîd encex bi tifaqa gelan dikare ji holê bê rakirin

## 'Emê bi îradeya xwe dîwarên parçekirinê hilweşînin'



Jinên ku tevlî meşa pîrozkirina 1'ê Gulanê roja cejna kedkarên cîhanê bûne, bi şermezar kirina dîwarên di navbera axa Sûriyê û Efrînê de gotin: "Gelê Efrînê ne ji dijmin û ne ji dîwaran ditirsin û dîwar li hember berxwedana wan nabe asteng." Di meşê de dirûşmeya "Bijî berxwedana Efrînê", "Bijî berxwedana serdemê" û "Şehîd namirin" hate avêtin.

## Rûspiyên Reqayê: Efrîn nakeve bazaran û nayê firotin

Rûspiyên êlên bajarê Reqayê teqez kirin ku dagirkeriya Tirk bi lêkirina dîwarê li Efrînê hewl dide xaka Sûriyê parçe bike û wiha gotin: "Ev jî dagirkirinek nû ye ji xaka Sûriyê re. Piştî bêdengiya rêjîma Sûriyê dê bersîva Bakurê Sûriyê wisa be: 'Tişta ku li Colan û Lîwa Skenderon rû daye, bi saya hevgirtina bi hêz a tevahiya pêkhateyên Bakurê Sûriyê, li Efrînê dubare nabe.'"



# 'DÎWARÊ PARÇEKIRINÊ BINPÊKIRINA QANÛNÊN NAVNETEWEYÎ YE'

Partiyên siyasî û koalisyonên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyaniyeke hevbeş der barê binpêkirinên dewleta Tirkiyê li kantona Efrînê û lêkirina dîwarê parçekirinê, li bajarê Minbicê dan. Partiyan destnîşan kirin ku dîwarê parçekirinê rûreşiyeke derheqê civaka navneteweyî ye û binpêkirina qanûnên wê ye.



### ARMANCÊ TIRKIYE EFRÎNÊ JI SÛRIYÊ QUT BIKE

Daxuyanî bal kişande ser van xalan: " Di demeke ku hêzên siyasî hewldana derketina bi çareseriya aloziya Sûriyê dikin, hikumeta Tirkiyê ya faşîst hewl dide ji vê mijarê derkeve, hemû nirxên mirovî û mafê gelan di jiyana hevbeş û jiyana ewle binpê dike. Hikumeta Tirkiyê bi dagirkirina xaka Sûriyê têr nebû, hemû cureyên sûcan pêk anîn, niha jî dîwarê parçekirinê yê Osmanî derdora bajarê aştiyê yê Efrînê ya Sûriyê lê dike, bi wê armanc dike ku bajarê Efrînê ji Sûriyê qut bike û wê dûrî nasnameya Sûriyê bike.

### HEMÛ KESÊN LI WELATÊ SÛRIYÊ BIBIN YEK


Ev dîwarê parçekirinê rûreşiyeke li ser civaka navneteweyî ye û binpêkirina qanûnên navneteweyî û hevpeyamana NY`ê ye, her wiha binpêkirina qanûnên mafê mirovan û çarenûsa gelan e. Em ji civaka navneteweyî û rêxistinên mafên mirovan dixwazin bi erka xwe ya exlaqî û mirovî rabe, her wiha em ji dewleta Sûriyê dixwazin helwesteke rast ji binpêkirinên Tirkiyê li ser xaka Sûriyê re deyîne û divê Tirkiyê hêzên xwe ji hemû Sûriyê li Cerablûs, Bab, Izaz û Efrînê derxe, em ji hemû kesên birûmet li welatê Sûriyê dixwazin bibin yek."



## Eşîrên Ereb ewê li ser paşeroja xwe biaxivin

Eşîrên Ereb ên li Sûriyeyê, wê 3'ê Gulanê li Eyn Îsayê bi pêşengiya Meclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD) li hev bicivin. Di civînê de wê rewşa siyasî, leşkerî, aborî, çandî û civakî ya herêmê û diyaloga navbera eşîran bê nirxandin. Tevî eşîrên li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê wê nûnerên eşîrên ji herêmên cuda yên Sûriyeyê jî tevlî civînê bibin.

## Di navbera Îsraîl û Xezayê de şer



Balafiran artêşa Îsraîlê deverên komên filistînî yên li Xezayê bombebaran kirin. komên filistînî jî bersiv dan û 2 mûşek avêtin bajarên Îsraîlê. Her wiha li Difa El-Xerbiyê jî artêşê 17 filistînî girtin.